Landeshauptstadt
München
**Sozialreferat**
Stadtjugendamt

# Zanyariyên têkildarî lênêrîna tenduristiyê ji bo xwendina li dibistanê

Dêûbavên hêja, sergêrên delal,

Zarokê we dê bi zûtî biçe dibistanê. Hemî zarokên Mûnîxê yên di navbera **Çar û pênc saliyê da**, beşdarî lênêrîneke tenduristiyê ji bo xwendina li dibistanê dibin.
Wek mînak, bînahî, bihîstin û pêşketina zarokê te ji hêla ziman va tê nirxandin. Di heyama lênêrînê da, kadroya bijîşkî diyar dike bê ka çawa û di çi waran da **beriya sala dawiyê ya zarokxaneyê,** dikarin zarokê te piştgirî bikin da ku destpêkirineke wî/wê ya baş li dibistanê hebe.

Ev lênêrîn li Bayernê **neçarî ye.** Loma hûn Vexwendnameyekê ji Rêveberiya Tenduristiyê werdigirin.
Hûn ê zanyariyên pirtir derbarê lênêrîna Tenduristiyê li xwarê bibînin:
muenchen.de/rseu

Heke piştî wergirtina vexwendnameya Rêveberiya Tenduristiyê zarokê xwe ji bo xwendina li dibistanê **neyînin** Lênêrîna Tenduristiyê, zanyariyên we dê ji bo Ofîsa Xortan a bajarê Mûnîxê bên şandin. Piştra **Ofîsa Xortan** digel we peywendî digire da ku sedema pêkneanîna lênêrînê tê derxe.

Navenda helwelatîbûna civakî piştgirî û alîkariyê
Raberî we û zarokê we dike. Ji bo ku bizanin bê ka kîjan navenda hemwelatîbûna civakî Li taxa we berpirs e, serdana vê lînkê bikin:
stadt.muenchen.de/service/info/sozialbuergerhaus/1060763/

Ofîsa Xortan a bajarê we

Esther Maffei
Rêveberiya Ofîsa Xortan a bajêr

**Wir sind München**
für ein soziales Miteinander

Weşanger: Mûnîxa navenda eyaletê I Rêveberiya Civakî I Ofîsa Xortan a bajêr, Beşa Parastina Zarokan, Luitpoldstraße 3, 80335 München
**Kurdisch**